

Tevlêbûna jinên Ereb ya nava YPJ'ê zêde dibe



nek li cihê biçê de wê bi erk û berrisvartiyên demê rabe".
EM BI BERXWEDANÊ MEZIN BÛN

Her wiha fermandar Leyla Waşokanî bi van gotinan bal kişandê ser gef û êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk: "Em wek Yekîneyên Parastina Jin, herdem amade ne ku gelê xwe biparêzin û em ê destûr nedin ku dijminê me bi rihetî bikeve xaka me. Em wekî jin û gelê Rojhilata Navîn li ser çanda berxwedaniyê mezin bûn û em ê vê çanda xwe heya serkeftinê bidomînin".
 Piştî şervananan soz dan ku ew ê welatê xwe û xaka xwe heya serkeftinek mayînde biparêzin, merasîma leşkerî bi dirûşmeya; "Jin Jiyan Azadî" bi dawî bû.
EMÊ LI BER XWE BIDIN
 Şervananan ku dewreya xwe ya perwerdehiyê li dawî kirin anîn ziman ku ew ê bi rengê herî aktîf tevî nava refên YPJ'ê bibin û ew ê li ser şopa heqîqetê li berxwe bidin...**ANHA**

Derbarê mayînan de welatî tên hişyar kirin

Rêxistina Syria Relief û Mac bi hevkarîya Meclisa Sîvîl a Dêrazorê ji bo hişyarkirina şênîyan li gundên têkildarî mayîn û bermahiyan ku çeteyên DAİŞ'ê çandibûn, dest bi pêngavekê kir. Her wiha meclîsên gundên rojhilat û bakurê Dêrazorê diwarên dibistan û sazîyan rengîn kirin. Ji bo parastina ewlehiya şênîyan, rêxistinên li gundên rojava û rojhilatê Dêrazorê dest bi pêngava hişyarkirina şênîyan, saziyên sîvîl û dibistanan der barê mayîn û bermahiyan şer de kir. Dersên hişyarkirine li bajarokên gundên rojavayê Dêrazorê yê El-Kesra, Hîmar El-Elî, Sewa,



Kiryarê komkujiyê diyar in, Roboskî li ber xwe dide

Di 28'ê Kanûna sala 2011'an 34 welatîyên gundê Roboskî yê bi ser navçeya Qilabanê a bajarê Şêrnexê ji aliyê balafirên şer yê dewleta Tirk de hatin bombebaran kirin û şehîd xistin. Bi vê komkujiyê xelegeke din li komkujiyên ku ji aliyê dewleta Tirk de li dijî Kurdan hatin kirin hat zêdekirin. Tevî ku 7 sal li ser vê komkujiyê re derbasbûne hê jî dewleta Tirk hesabê wê nedaye. Berxwedana Roboskî ya rûmet û edaletê berdewam dike.

Di ser Komkujîya Roboskî re 7 sal derbas bûn. Li dû 34 bedenên parçekirî şerm û rûreşiyê mezin ma ku her kesî para xwe jê girt. Roboskî bi rûmeta xwe li ber xwe dide. Ji bo hovîtiya mezin a li Roboskî gotin "şaştiyêke ji neçarî" û bi hêsanî dosya girtin. Di nava 7 salên derbasbûyî de tenê tiştê fermî ji bo xizmetên qurbanîyan hate kirin. Ew jî; girtina komeleya wan bû. Bîrdariya Roboskî ya li Amedê hate rakirin. Parêzerê malbatên qurbanîyan Serokê baroya Amedê Tahîr Elçî hate kuştin. Parlamenterê HDP'yê Şîrnexê Ferhat Encu ku di komkujiyê de bira û 9 xizmetên wê hatin kuştin, hin jî dilgirtî ye. Dewleta ku wekî Roboskî dîl girt û komeleya wê girt, Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) jî kir şîrkê hewlndanên xwe yê ji bo nixamandina sûcê xwe. Roboskî di şexsê malbatan de bi gotina "em ê ji bir nekin" cihê xwe di hiş û mejiyê Kurdan de girt. Li ser sinorê çêkirî yê Kurdistan parçe kiriye, li gundên Bujeh û Roboskî rojeke ji rêzê bû. 38 kesên 17-18 salî roja 28'ê Kanûna 2011'an danê nivro ji wesayîten ji Zaxoyê hatibûn şeker, birinc, çay û mazot kirin. Bûn du kom û êvarê saet 19.17'an berê xwe dan sinorê bakur ji bo veşerîn. Piştî 30-40 deqeyan, bi 5-6 kilometreyan 5 fişekên ronîkirin û 7 gule berdan pêşîya koman. Her du koman bihiştin ku rê hatîye girtin û li cihêkî li ser sinorê sekinîn. Dema ku ew sekinîbûn, erkana leşkerî ya li Navenda Tevgerê ya Fermandariya Giştî ya Tirk û Hêzên Hewayî yê Tirk fermana siyasî wergirtibûn û ji bo komek ji Kurdan bikujin, bi kelecaneke mezin li bendê bûn.



kar bûn; ambûlans di rê de sekinandin, nehiştin ku ti ji hêzên rizgarkirinê biçê. 7 ji 8 birîndaran li ser piştî xizmetên xwe di rê de can dan. 34 mirov, 34 zarok, 34 Kurd hatin kuştin. Vê yekê bi navê "Komkujîya Roboskî" cihê xwe di hiş û mejiyê Kurdan de kir. Komkujiyêke din li komkujiyên ku li Kurdan hatin kirin zêde kirin. Nûçegihanên Kurdan ragihandin ku komkujiyêke din hatîye kirin. Lê rayedarên dewleta Tirk, medya wan xwe ker kiribûn û digotin, firsendekê dît û bi heman rengî tevgeriya. İdîa kir ku rêyên hiqûqa navneteweyî temam nebûne û serlêdan red kir. Ji dozgeriya Qilabanê hate Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, pêkhatayan hemûyan bi hev re hiqûq kuştin. Di ser Komkujîya Roboskî re 7 sal derbas bûn. Li dû 34 bedenên parçekirî şerm û rûreşiyê mezin ma ku her kesî para xwe jê girt. Kiryar diyar e, nayê cezakirin. Roboskî bi rûmeta xwe li ber xwe dide...**ANF**

WÊ KES NIKARIBE AXA ME DAGIR BIKE



GELÊN BAKURÊ SÛRIYÊ WÊ LI BER DAGIRKERAN RABIN
 Hêrsa gelên Bakurê Sûriyê ya li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk a dagirker her diçe zêde dibe. Rûspiyên Kurd, Ereb, Keldan, Asûr, Suryan, Êzidî û Meclisa Rûspiyân yê herêma Dêrikê li ber navenda Meclisa Êlan a Herêma Dêrikê li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yê li ser Bakurê Sûriyê daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de hat diyar kirin wê gelên Bakurê Sûriyê bi hev re li ber dagirkeriya Tirkîyê rabin. **R-5**

Heta şikandina tecrîdê wê çalakî bidome



Li Strasbûrgê çalakiya greva birçibûnê ya ji bo şikandina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ya 17'ê Kanûnê bi daxuyaniyêke ya çapemeniyê destpê kir, bi 15 kesan dewam dike. Ji roja destpêkê de bi sedan kes rojane serdana çalakiyê dikin. Çalakvanan anî ziman ku bi biryardarî li heta tecrîda li ser Ocalan bişkinin wê çalakiya xwe bidomînin. **R-2**

Welatîyên El-Hîşê li ber dagirkeriya Tirkîyê rabûn



Nerazîbûna gelên Bakurê Sûriyê li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk zêde dibe. Bi vî armancê Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê li bajarokê El Hîşê ya bi ser Girê Spî çalakiyek lidarxist. Welatîyên ku beşdarî çalakiyê bûn diyar kirin ku ew ê li hemberî dagirkeriya Tirkîyê li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin. **R-2**

YNK'ê piştgirî da çalakiya greva birçibûnê

Çalakiya greva birçibûnê ya li Nûnertiya HDP'yê ya li Hewlêrê ya li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan di roja 38'ê emîn de dewam dike. Endamê Mekteba Peywendiyên Giştî ya YNK'ê Azad Colla li Hewlêrê serdana çalakiya greva birçibûnê kir û ji bo azadiya Rêber Ocalan piştigirîya partiya xwe ragihand. **R-4**

Şandeya şaredariyên Bakurê Sûriyê serdana Îtalyayê kir

Şandeyeke Desteya Şaredariyan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê serdana şaredariyên Îtalyayê kir. Şandeyê li gelek bajarên mîna Torino, Barî, Bologna û Padova serdana gelek saziyên xizmetguzariyê kir û bi rayedaran re hevditin pêk anîn. Berdevka Şandeyê Bêrivan Umer spasiya şaredariyên Îtalyayê û diyar kir şaredariyên wan hê nû ne û ew ê têkiliyên bi şaredariyên Îtalyayê re bi hêz bikin. **R-6**



Gelên Sûriyê wê li ber êrîşên Tirkîyê rabin
 Nerazîbûnên li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk yê li ser Bakurê Sûriyê dewam dikin. Rûspiyên eşîrên Sebê û El Weldê yê Reqayê li ber êrîşên dagirkeriyê yê Tirkîyê rabûn û diyar kirin ku gelên Sûriyê çawa dagirkeriya Osmanîyan qebûl nekin ew ê dagirkeriya Tirkîyê jî qebûl nekin. **R-5**

Ji bilî berxwedanê rêyek din tune




Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû, di salvegera 7'an a Komkujîya Roboskî de diyar kir ku ji bilî berxwedanê rîyekê din a li dijî mejiyê qirker nîne. Karasû wiha got, "gefên ji bo dagirkeriya Rojava, êrîşên li ser Mexmûr û Şengalê û zîhnîyeta ku li Roboskî komkujî kir, heman mejî ye." **R-4**

Bi rêxistin, hêz û îradeya jinan wê êrîş têk biçin



Li bajarê Minbicê bi dirûşmeya "Jinên birêxistinîkirî misogerîya Sûriyêke demokratîk e" 1'ê emîn Konferansa Meclisa Jinan a Minbicê bi tevlêbûna bi dehan jinan hat lidarxistin. Seroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriya Demokratîk Îlham Elmedî di konferansê de axivî û diyar kir ku Minbic di bin dagirkeriya Tirkîyê de ye û da zanîn ku wê bi hêz û îradeya jinan êrîş werin têkbirin. **R-4**

Tirkîye dixwaze bi rêya hin eşîran fitneyê derxîne



Şêxê Eşîra Hatim El-Teyî Elî El-Elî lîstîk û planên dewleta Tirk yê li ser hin eşîrên Ereb nixwand û diyar kir ku Tirkîye hewl dide di nava gelan de fitneyê derxîne û diyar kir ku hinek şêxên ku dewleta Tirk li Ezazê komkiribûn ew nûnertiya gelên herêma nakin. El Elî bang li hemû eşîrên Ereb kir ku bi hev re li pêşîya gefên dagirkeriya Tirkîyê bisekinin. **R-4**



Heta şikandina tecrîdê wê çalakî bidome

Çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo şikandina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasboûrgê hatibû destpêkirin, di roja 12'an de dewam dike. Ji roja yekem a çalakiyê ve serdanên welatîyan jî dewam in. Li Strasboûrgê çalakiya greva birçîbûnê ya 17'ê Kanûnê bi daxuyanîyeke ya çapemeniyê û şûnde destpê kir, Parlemetera HDP'ê Dîlek Ocalan jî di nav de bi 15 kesan dewam dike. Ji roja destpêkê ve ya çalakiya li Navenda Cîvaka Demokratîk a

Kurd a li Strasboûrgê destpê kir û vir ve bi sedan kes rojane serdana çalakiyê dikin. Çalakiya ku tevgerên çep ên Tirkîyî û komele destek dikin, ji ber Cejna Noelê serdanên ji bo çalakiyê hê zêdetir bûne. **DAXWAZA HEVDÎTINÊ JI BO KE Û CPT'YÊ** Çalakvanên ku ji bo şikandina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tevî çalakiya greva birçîbûnê ya bêdawî û bêdorojê bûne, daxwaza hevdîtîna jî Komîteya Pêşlêgirtina Eşkenceyê

(CPT) a yekane bi erka hevdîtîna radibin, kir ku biçin Îmralî hevdîtîna pêk bînin. Çalakvanên ku li ser armaca xwe ya ketina grevê ji bo rayedarên KE û CPT'ê ragihandin, CPT ya ku yekane saziye ku bikare biçe Îmraliyê hevdîtîna pêk bîne divê tavilê bi erka xwe rabe û biçe hevdîtîna li gel Ocalan bike. **DÎDF SERDANA ÇALAKIYÊ KIR** Di roja 11'an de jî gelek sazî û komele serdan çalakgerên çalakiya grevê kirin. Îro jî DÎDF serdana

Li Strasboûrgê çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo şikandina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ya 17'ê Kanûnê bi daxuyanîyeke ya çapemeniyê destpê kir, bi 15 kesan dewam dike. Ji roja destpêkê de bi sedan kes rojane serdana çalakiyê dikin. Çalakvanan anî zîman ku bi biryardar in heta tecrîda li ser Ocalan bişkînin wê çalakiya xwe bidomînin.

çalakiyê kir. Çalakvanan têkildarî çalakiya xwe daxwazên xwe ji bo wan vegotin. **‘EM Ê BI VÎNEKE BIHÊZ SERBIKEVIN’** Hevserokê Kongreya Cîvaka Demokratîk a Kurdên Ewropa (KCDK-E) Yuksel Koç ê tevî çalakiyê bûye, anî zîman ku bi biryardar in heta tecrîda li ser Ocalan bişkînin wê çalakiya xwe bidomînin. Koç destnîşan kir ku em ê bi vîneke bi hêz serbikevin.”

Li Heçîne herî kêm 15 çete hatin kuştin

Di operasyona Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) de ya li dijî çeteyên DAÎŞ'ê yê li Heçîne şerê giran qewimî. Di şer de herî kêm 15 çete hatin kuştin. Li gorî agahiyan şer li Başûrê Rojhilat û li Rojhilatê Heçîne pêk hat. Piştî ku çeteyên DAÎŞ'ê xwe ji herêma vekişandin QSD'ê li herêma operasyonêk da destpêkirin. Hate ragihandin ku di şer de 15

çete hatine kuştin û şervanên QSD'ê di operasyonê de gelek tunelên çeteyan rûxandîye û dest daniye ser gelek cebîlxaneyan. Hate diyarkirin ku hawaneke 120 mm û roketên wê, 4 kaleşnikof, SPG-9'ek, komputer û gelek alavên leşkerî hatine desteser kirin. Di operasyonê de 6 wesayîtan çeteyan hatine îmbakirin û hin rê ketine bin kontrola şervanên QSD'ê.



Welatîyên El-Hîşê li ber dagirkeriya Tirkîyê rabûn

Şênîyên bajarokê El-Hîşê diyar kirin ku ew ê bi hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî dagirkeriya Tirkîyê li ber xwe bidin. Tevgera Cîwanên Şoreşger a Sûriyê li bajarokê El-Hîşê Ednan El-Şêx, hevserokê meclîsa bajarok Hemûd El-Hemûd, endama rêveberiya jin Kefaa El-Ebo û endamê komîteya parastîna di meclîsa navçeya Eyn Îsa Mihemed Ebo Leyla axivîn. Di axaftinan de gefên Tirkîyê yê li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin şermezar kirin.

Serêkaniyê û Dirbesiyê hat lidarxistin. Di çalakiyê de li ser navê Tevgera Cîwanên Şoreşger a Sûriyê li bajarokê El-Hîşê Ednan El-Şêx, hevserokê meclîsa bajarok Hemûd El-Hemûd, endama rêveberiya jin Kefaa El-Ebo û endamê komîteya parastîna di meclîsa navçeya Eyn Îsa Mihemed Ebo Leyla axivîn. Di axaftinan de gefên Tirkîyê yê li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin şermezar kirin.

Meclîsa Şengalê damezrandina xwe ji Bexdayê re ragihand

Pêkhateyên Şengalê û nûnerên siyasî yê Şengalê di encama danûstandîna 2 mehan de ji bo heya pêkhatina hilbijartinên herêma meclîseke demkî ragihandin û ji bo pejrîrandîna jî pêşkêşê hikûmeta Federal a Iraqê hate kirin. Pêkhateyên Şengalê li dijî hatina idareya berê ya Şengalê a girêdayî PDK'ê û daxwaza idareyeke nû dikirin. Li ser daxwaza Şengaliyan hatina qeymeqamê berê yê Şengalê Mehma Xelîl hatibû sekinandin. Pêkhateyên cûda yê Şengalê û aliyên siyasî yê li herêma



însiyatîfêk avakirin û li ser vî esasê hinek hevdîtîna li gel hikûmeta Iraqê çêbibe, hemû karên îdarî yê Şengalê birêve bibin. Ji bo vî jî ev meclîsa demkî listeya meclîsa nû ya demkî ji bo erêkirinê ji hikûmeta federal a Iraqê re şandi-ne. Bi tevîlûbîna rûspî, serok eşîr û kesayetên û nûnerên cûda yê pêkhatê û aliyên siyasî yê Şengalê meclîsa demkî bi daxuyanîyeke çapemeniyê hate eşkere kirin.

Îmaratê sefaretxaneya xwe ya bilind a li Şamê dîsa vedike

Mîrtiyên Ereb ên Yekbûyî ku hevalbendê nêz ê Erebîstana Sîudî ye, wê sefaretxaneya xwe ya bilind a li paytexta Sûriyê Şamê roja Pêncşemê veke. Sefaretxane 7 sal in girtî ye. Rayedarekî Wezareta Ragihandinê ya Sûriyê ji AFP'ê re axivî û got, “Li ser daxwaza Wezareta Karên Derve, Wezareta Ragihandinê ya Sûriyê bang li rojnâmevanan kir ku tro tevî merasîma vekirina sefaretxaneya bilind a Mîrtiyên Ereb ên Yekbûyî ya li Şamê bibin.” Hikûmeta Sûriyê roja 18'ê Kanûnê bang li welatên Ereb kiribû ku sefaretxaneyên xwe yê bilind ên li Şamê ji nû ve vekin. Ji sala 2011'an dema destpêkirina şerê navxweyî yê Sûriyê û vir ve, di serî de welatên kendavê gelek welatên Ereb mîsyonên xwe yê diplomatîk ên li Sûriyê rawestandibûn.

Êzîdî, Ereb, Tirkmen, Sune, Şîe, nûnerên partiyên Êzîdî, nûnerê partiyên Başûr yê li Şengalê jî cihê xwe digirin. Her wiha nûnerên jinan jî di nava meclîsê de cih digirin. Ev meclîs eger ji aliyê hikûmeta Iraqê ve were erê kirin wê heya hilbijartinên herêma yê Iraqê çêbibe, hemû karên îdarî yê Şengalê birêve bibin. Ji bo vî jî ev meclîsa demkî listeya meclîsa nû ya demkî ji bo erêkirinê ji hikûmeta federal a Iraqê re şandi-ne. Bi tevîlûbîna rûspî, serok eşîr û kesayetên û nûnerên cûda yê pêkhatê û aliyên siyasî yê Şengalê meclîsa demkî bi daxuyanîyeke çapemeniyê hate eşkere kirin.



Li Dersimê rêya 222 gundan hat girtin

Li Dersimê ji ber barîna berfê rêya 222 gundan ji çûn û hatê re hat girtin. Li navçeyan jî ji ber têlên ceryanê ketine xwarê ceryan hatiye birrîn. Li Dersimê ev 2 roj in barîna berfê bandorek neyînî li ser jiyana kir û li tevahiya bajêr jî ber berfê rêya 222 gundan ji çûnê hatê re hatiye girtin. Li navçeyên Pulur, Pilemûriye, Qisile û Xozatê li cihên bilind stûriya berfê gihiştîye nêzî metroyekê. Ji ber barîna berfê rêya bejahiyê ya di navbera Pilemûriyê û Erzînganê de ji dem bi dem tê girtin. Ji ber bandora neyînî ya berfê têlên dirêgên ceryanê yê navçeyên Pîlumûriye, Pulur, Qisile, Mazgêrd, Çemişgezek û Xozatê ketine xwarê û li navçeyan ceryan çûye. Barîna berfê didome û xebata vekirina rêyan didome.

Çerxereya “Şehîd Bêrîtan” hat vekirin



Şaredariya gel a rojhilatê kantona Heseke ya herêma Cizîrê, çerxerêyek li navçeya El-Xîşman bi navê “Şehîd Bêrîtan” a ku bûye sembola jina azad, hat vekirin. Bi sedan şênîyên kantona Heseke çerxereya ku ji aliyê Şaredariya El-Şerqiyê ve hat serastkirin û ji nû ve vekirin. Çerxerêya navçeya El-Xîşman gelek hilweşiyabû û xerabûbû, vî yekê hişt ku ji aliyê gel ve bibe cihê rexneyê. Rêya ku derdora çerxerêyê dizivirî, yek ji rêyên sereke ya Heseke ye. Di merasîmê de Endama Rêveberîya Komîteya Şaredarî û Ekolojîyê ya Şaredariya Heseke, Raziya Bîrahîm axivî û diyar kir ku vekirina vî çerxerêyê ji bo bedewbûna herêma gaveke girînge. Raziya bal kişand ser binavkirina çerxerêyê û wiha axivî: “Ji ber ku Şehîd Bêrîtan bi berxwedana xwe ji gelê Kurd, Rojhilata Navîn û hemû jinan re bû nimûne me navê wê li vî çerxerêyê kir.” Piştê dayikên şehîdan qomçeya vekirina çerxerêyê birrîn û perde ji ser wêneyê Şehîd Bêrîtan hat rakirin. ...ANHA

2000 kes li Filma 14`ê Tîrmehê temaşe kir

Li Sinema Salim pêşandana filmê 14`ê Tîrmehê bi dawî bû. Piştî ku cara dawî film hate pêşandan nave-roka film hate gotubêj kirin. Li Sinemaya Salim a Silêmaniyê li ser daxwaza temaşevanam sê heftan filma 14`ê Tîrmehê ya li ser berxwedan û têkoşîna pêşengên PKK`ê yê di girtîgehê de hate pêşandan. Piştî ku li sinema Salim cara dawî filma 14`ê Tîrmehê hate pêşandan, sinemakar Hewraz Mihemed, nivîskar Faruq Refîq, nivîskar û rojnâmevan Hesen Cudî naveroka filmê gotubêj kirin. Kesên axivîn diyar kirin ku filma 14`ê Tîrmehê duym filmê ku li Tirkîyê tê qedexekirin. Hat gotin filma 14`ê Tîrmehê berxwedana tevgera azadîxwazî ya Kurdan a di zindanê de li dijî faşîzma dewleta



Li Sinema Salim a bajarê Silêmaniyê li ser daxwaza temaşevanam sê hefteyan filma 14`ê Tîrmehê ya li ser berxwedan û têkoşîna pêşengên PKK`ê yê di girfîngeha Amedê de hate pêşandan. Zêdetîrî 2000 kesan li filmê temaşe kirin. Piştî cara dawî filma 14`ê Tîrmehê hate pêşandan, sinemakaarannaveroka filmê gotubêj kirin.

Bi helwdana xwe ferî tembûrê bû

Welatîyê bi navê Mihemed Hec Welo bi awayekî veşarî fêrî lêdana tembûrê dibe û gelek berhemên gelêrî ku nişna nû guhdar nekirine jiber dike. Mihemed Hec Welo li gundê Omera yê girêdayî navçeya Şera ya Efrînê di sala 1951`î de hatiye dinê. Lêdana tembûrê ji bavê xwe fêr bûye. Mihemed Hec Welo ji mal derdiket, Mihemed bi dizîka diçû û li tembûrê dida. Dema bavê wî vedigeriya malê pê dihesiya ku sîstema têlên tembûrê hatiye

guhertin û dizanî ku Mihemed bi kar anîye. Girêdayî vî Mihemed wiha got: “Bavê min têgihîşt ku wê nikaribe min ji lêdana tembûrê dûr bixe, ji ber wê jî gav bi gav ez fêrî ritmên stranên gelêrî yê kevnan dikirim. Ez fêrî her du lêdana dest û rişê bûm.” Bavê Mihemed Hec Welî şevbêrk li dar dixist û stranê gelêrî li ser dengê tembûrê digot. Gelek welatîyên ku li tembûrê didan û stranê gelêrî dîstiran di wan şevbihêrkan de amade dibûn. Hinek ji wan Reşîd Mabata, Adîk, Mistefa Bîlûd, Hes Nazî, Elî Tîco û Cemîl Horo bûn. Piştî ku Mihemed baş fêrî tembûrê

dibe, diçe şahiyên û di dawetên kurdan ên li Heleb û Şamê de, bi hunermendên navdar re li tembûrê dixwe. Mihemed Hec Welo awazên gelek destanên kurdan ên weke; Memê Alan, Siyad Ehmed, Edûlê Ûmera û Şerîf Beg, Cembelî û Goh Reşê Mîrza Begê dizane û lêxistiye. Mihemed di jêzeminan de jî li tembûra xwe dixist Di dema êrişên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê de li dijî kantona Efrînê di dagirkirina wê de, Mihemed jî gund derxwade û bi tembûra xwe li ber xwe dide.



Dengê berxwedanê jî dengê topan û fuzeyan bi hêzîr bû. Mihemed li kolan û jêzeminên beylî ku ji çeteyan bitirse li tembûra xwe dixist. Di dawiyê de Mihemed diyar kir ku wî li Efrînê bi lêdana tembûrê li kolan û jêzeminan li ber xwe daye û wê li Şehbayê heta Efrîn rizgar bibe li berxwe bide. ...ANHA

Şanoya Bajêr a Amedê atolyeya dramayê vedike



Wê Şanoya Bajêr a Amedê, di sala nû de dest bi dayîna dersên şanoyê bike. Her wiha wê ji bo zarokan jî dersên dramayê bide. Şanoya Bajêr a Amedê xebatên xwe didomîne. Şanoyê heta niha gelek şanogerên ciwan gihandiye û niha jî hewl dide ji bo zarokan atolyeya dramayê veke û ji bo bedewbûna herêma gaweke girînge. Raziya bal kişand ser binavkirina çerxerêyê û wiha axivî: “Ji ber ku Şehîd Bêrîtan bi berxwedana xwe ji gelê Kurd, Rojhilata Navîn û hemû jinan re bû nimûne me navê wê li vî çerxerêyê kir.” Piştê dayikên şehîdan qomçeya vekirina çerxerêyê birrîn û perde ji ser wêneyê Şehîd Bêrîtan hat rakirin. ...ANHA



Helbesta yekemîn bi zîmanê Kurdî xwend

Koma Helbestê ya Amedê ku ji du hefteyan carekê li Amedê kom dibe û helbestkarên ku bi zîmanê kurdî helbestana dinivîsin dike mewan, vî hefteyê helbestkar Nezahat Dogan kir mewan. Helbestkar Nezahat Dogan ku xwediyê du berhemên bi navê “Çîroka Emrê Min” û “Demsalên Şikestî” ye got ku xizmeta ji bo zîmanê dayikê û helbestên kurdî ji bo wê sanazî ye. Helbestkar Dogan di berdewamê de diyar kir ku hemû berhemên xwe bi zîmanê kurdî nivîsandine û wiha axivî: “Helbestên min şopa jiyana

min in. Min helbesta yekem jî bi zîmanê kurdî xwend. Ez di temenekî biçûk de hatim zewicandin û ji Mêrdînê derbasî Qamişloyê bûm. Piştî ku ez şer mehan li Qamişloyê mam derbasî Swêdê bûm. Min cara yekem di 22 saliya xwe de dema ku keçîka min jiyana xwe ji dest da dest bi helbestê kir.” Şevbihêrka Helbest û Muzîkê ya Koma Helbestê ya Amedê bi nîrxandina berhemên Dogan ên “Çîroka Emrê Min” û “Demsalên Şikestî” û bi stranên hatin gotin bi dawî bû.

Standartkirina Zîman

Xakî BÎNGOL

Beriya bi 2 mehan li Amedê jî bo xebatên li ser zîmanê Kurdî civînek pêk hat. 9 partiyên siyasî (HDP, DBP, ÖSP, KDP-T, KDP-B, PSK, PAK, Hereketa Azadî û Partiya Insan û Azadîyê) tevî civinê bûn. Piştî vî civinê ti deng ji wan partî û rêxistinan derneket. Derketibe jî min nebihistiye. Naha em xebata wan partîyan li hêlekî bihêlin. Bêguman divê partiyên siyasî jî di warê zîman de erka xwe bi cih bin in. Tişta ez dixwazim em niqas bikin eve; gelo standartkirina zîman karê zîmanzan, akademîsyen û medyayê ye, an karê partiyên siyasî ye? Dema mirov medya Kurdî dişopîne bi rastî jî herkes û sazi cûda û bi gorî xwe Kurdî dinivîsin û diaxivin. Gelek cudahiya zîman, hevok û devokan di navbera kanalên tv`yên Kurdî de xuya dike. Herwusa di warê nivîskî de jî tevlihevîyek heye. Jixwe ez naxwazim behsa medyaya civakî bikim! Di Romana Kurdî û Helbesta Kurdî de jî bi hêsanî mirov dibîne ku bê çîqas cudahi û tevlihevî heye. Gelo Medya Kurdî jî bo zîman rola xwe dilîze? Dema mirov bala xwe dide medyayê, her sazi an jî der û dor form an jî şewçaya rastnivîsa xwe weke a herî rast e dibîne. Bi ya min beriya partiyên siyasî divê sazi û dezgeyên Medya Kurdî ya dîtar û nivîskî li hev bicivin û bi alîkariya zîmanzan û akademîsyenan li ser zîman rawestînin û zîmaneke hevpar ku tevahiya civakê bikaribe bi hêsanî jî fêm bike bikar bînin. Eger Medya Kurdî bi berpirsyarî tevgerê û di warê standartkirina zîman de rola xwe bilîze, wê pêşveçûn çê be. Çima Zîman ne karê partiyên siyasî ye?

Tevgera Azadîya Kurdistanê 25 sal beriya naha Medya Kurdî ya dîtar ava kir. Nêzîkî 30 salin jî bi dehan Rojname, Kovar û weşanên cûr bi cûr bi Kurdî derdikarin. Lê belê hîna jî bi taybet li Bakurê Kurdistanê zîmaneke hevpar û bi rêk û pêk nahatiye rûniştin. Eger bi partiyên siyasî zîman bahata standartkirin jixwe tevgera Azadîyê dema Medya dîtar ava kir, wê zîman stadart bîkîra. Lewma jî karê partiyên siyasî ne mijara standartkirina zîman e. Partiyên siyasî tenê dikarin rê li pêşîya zîmanzan, akademîsyen û Medyayê veke û ji wan re bibin alîkar. Bi ya min divê sazi û dezgeyên Medya Kurdî ên ji herçar parçeyên Kurdistanê bi lez û bez li hev bicivin û bi rojan konferans û panelan li dar bixin, di encamê de komîsyona zîman ava bikin. Divê ev komîsyon jî kesên pispor pêk were û ji hêla tevahiya civakê Kurdistanê ve were qebûlîkirin. Eger ev pêk were wê hinek hêsanî çê bibe, an bi civîna partîyan ti caran zîman nabe zîmaneke standart.



Li Dêrezorê mazot tê belavkirin

Bi destpêkirina zivistanê re belavkirina mazotê li welaîyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam dike. Bi afîkariya meclîs û komînên gundewarên rojava û rojhilatê Dêrezorê, Saziya SATKOP'ê mazotê li welaîyan belav dike. Saziya SATKOP'ê ji destpêka zivistanê de mazotê bi buhayeke guncaw belav dike.

Bi alîkariya meclîs û komînên gundewarên rojava û rojhilatê Dêrezorê, Saziya SATKOP'ê mazotê bi buhayeke guncaw li welaîyan belav dike. Rêveberiya sotemeniyê li gundewarên rojhilat û rojavayê Dêrezorê piştewaniya gel ya belavkirina mazotê

dike. Bi taybetî di vê zivistanê na ku baran û sermayê xwe zêde ye mazot pêwîstiyek e. Li bazarên reş bihaya mazotê zêde ye. Lewma jî SATKOP mazotê bi bihayeke guncaw belav dike. Xwediyê benzînxane ya gundê El-Kisra ya rojavayê Dêrezorê

Hemdan El-Selame diyar kir ew bi rêveberiya SATKOP'ê re mazotê belav dikin. Niha li giştî El-Kisra ya ku 4 hezar û 200 malbat lê dijîn mazot hatiye belavkirin. Her wiha li gor plana belavkirina mazotê, li gundewarên rojava û rojhilatê Dêrezorê

belavkirin berdewam e. Saziya SATKOP'ê ji destpêka zivistanê de mazotê bi buhayeke guncaw belav dike. Her litreyek bi (55) lire yê Sûrî ye. Her wiha para her malbatekê (400) litre ye û li ser du beşan tê belavkirin.

Sobeyên êzîngan li ber tinebûnê ye

Hosteyê sobeyan Mihemed Şîrîn Ûslû ku 20 sal in li sûka kevn a Sûrê sobeyan çêdike, tevî zor û zehmetiyên giran jî bi biryardarî xwedî li pişeyê xwe derdikeve. Karê çêkirina sobeyên êzîngan, ku pişeyê pêşyan e, jî ber pêşketina sobeyan bi biryardarî xwedî li karê xwe derdikevin. Li vê bazarê sobeyên êzîngan, agir-dank, semawer, sênî û çaydan tîn çêkirin.

Hosteyê sobeyan Mihemed Şîrîn Ûslû dibêje, li hemberî pêşketina teknolojîyê hunera wan li ber tinebûnê ye û wiha axivî: "Zêdetirî 15-20 sal in li Sûka kevn a Sûrê sobeyan çêdikim. Di temenê biçûk de ez li ber destê apê xwe fêrî vî pişeyî bûm û niha jî ez û apê xwe bi hev re vî karî dikim. Karê me jî ber pêşketina teknolojîyê kêm bûye. Di werza havînê de em parçeyên sobeyan û lûleyan amade dikin û di werza zivistanê de jî dest bi çêkirina sobeyan dikin. Di nava rojê de nêzî 50 sobeyan em çêdikim. Em li vir sobeyên êzîngan, borî, sênî, agir-



dank, semawer û çaydan çêdikim. Di werza zivistanê de sobeyên daran tene firotin û havînê jî semawer û agir-dank tene firotin. Weke salên berê edî kes naxwaze vî karî bike. Em jî dixwazin vê hunera bav û kaşan bidomînin." NÎŞTECIHÊN GUNDAN SOBEBAN DISTÎNIN Ûslû da zanîn ku niştecihên gunda tene sobeyên êzîngan distînin û wiha dewam kir: "Berî gaza xwezayî were Amedê karê me gelekî baş bû. Li her malekê

sobeyên êzîngan hebû. Lê belê piştî gaza xwezayî hate bajêr weke berê kes sobeyan bi kar nînin. Tenê gundî tîn û sobeyên êzîngan dikirin. Sobeyên êzîngan jî gaza xwezayî baştîre û xweş germ dike. Her wiha agirê êzîngan jî bo tenduristîya mirovan jî baş e. Gaza xwezayî dibe sedema nexweşîyan."

BANDORA KRÎZA ABORI Ûslû anî ziman ku krîza aboriyê bandor li karê wan jî kirîye û got, "Nêzî 3 sal in karê me nebaş e. Em sacên xwe bi dolar dikirin û vê sala dawî buhayê wan bûye sê qat. Niha qîmetê sobeyan ên herî erzan jî 45 heta 50 lireyî ye. Sobeyên sac ên baş jî ji 200 heta 600 lireyî ye."...ANF

Şaredariya Qamişlo ya xerbî gaveke nû davêje

Bi armanca nîrxandina kar û xebat mehekê ye Meclîsa Navçeyê Xerbî ya bajarê Qamişlo bi Endamên komîn û berspîesên xizmetguzarî li Navneda Çand û hunera Mîmed Şexo ya Qamişlo civînek hate li darxistin. Di vê civînê de gel û endam û berpîrsên xizmetguzariyê anin beramberî hev da ku pîrsgirêkan niqaşkin û çareser bikin, ev gevek nû û erîne bû.

Elektîrîk û avê di çarçoveya civîna mehane de li hev dîcîvin. Di vê civînê de jî ber ku Şaredarî berpîrsê serke yên xizmetguzariya civakê ye, rexne herî zêde jêre hatin. Ku di çarçoveya zelelîkirina kêmaniyên ku di şaredariyê de derbasbûn Hevsoroka Şaredariyê Zozan Ibrahim anî ziman ku hind pîrsgirêkên xizmetî di çarçoveya şaredariyê de tene çareserkin. Û diyar kir ku hin projeyên xizmetî hene hin di lêkolîn û lêhûrbûnê dene, bi alîkariya gel û û mîna wan civînan emê heya astekekê karibin jî pîrsgirêkan civakî û xizmetî re bibin bersiv. **Ronahî/Qamişlo**

Şandeya şaredariyên Bakurê Sûriyê serdana Îtalyayê kir

Şandeyê Desteya Şaredariyan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê serdana şaredariyên Îtalyayê kir û bi rayedarên Îtalyayê re hevdiîtin pêk anin. Buroya Ragihandinê ya Desteya Şaredariyan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihand ku şandeyêke desteyê serdana şaredariyên Îtalyayê kirîye. Serdan di çarçoveya belgeya lihevkerîne ya di navbera desteyê û Yekitiya Niştîmanî ya Şaredariyên Îtalyayê û bi alîkariya rêxistina UPP û bi pişt-giriya Wezaretê Karên Derve ya Îtalyayê de pêk hat. Şandeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî pişporên mijarên avê, bermahîyan, plansaziya sivil û projeyên taybet pêk hat û endamên şandeyê jî bajarên Heseke, Qamişlo, Til Koçer û Serêkaniyê ne. Şandê destpêkê çû navenda giştî ya avê li bajarê Napoli û li wir bi rayedarên re hevdiîtin pêk anin û der barê sistemên xebatê û alavan de agahî wergirtin. Paşê şandeyê



li navenda Şaredariya Napoliyê civîneke çapemeniyê li dar xist û hate xwestin ku di navbera şaredariyên her du alîyan de têkîlî û hevkarî bi pêş bikeve. Berdevka şandeyê Bêrivan Umer di civîna çapemeniyê de axivî û spasiya aliyên ku bûne alîkar kir, her wiha der barê sistema şaredariyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hin agahî dan û diyar kir ku ew rêzê didin hawîrdorê û got jin bi sistema hevserokatiyê di nava şaredariyan de çalak in. Şandeyê li gelek bajarên mîna Torino, Barî, Bologna û Padova serdana gelek saziyên xizmetguzariyê kir û bi rayedaran re hevdiîtin pêk anin û agahî wergirtin. Di dawîya serdanê de berdevka şandeyê Bêrivan Umer spasiya şaredariyên Îtalyayê û Wezaretê Karên Derve kir ku ew derfet dane wan. Bêrivan Umer got şaredariyên wan hîna nû ne û ew ê têkiliyên bi şaredariyên Îtalyayê re bi hêz bikin.

RAMANÊ RÊBERTIYÊ

Weke Hebûn, Heyîn Kurd -1-

Abdulah Ocalan

Mirov rabe bi rêbazên dirokê yê tene qebûlîkirin hewl bide hebûna Kurdan tespît bike û bide naskirin, mirov ê li gelek zor û zehmetiyan rast bê. Dirokê û cografîya lê dimînin bi dijwarî bandor li wan kirîye û ew neçarî marjînalbûnê kirine. Li gorî lêkolînan, pêşiyên mirovên îro Homo Sapiens bi qasî sêsed hezar salên dawî yê diroka xwe pêşketine û di nava ruhberên din de bûne cinsê serdest. Em dibînin ku ev pêşketin li Kevana Bi Bereket ango li cografîya ku dikeve navenda Kurdistanê ya îro pirranî Kurd lê dimînin, pêk hatiye. Di diroka bi qasî sê mîlyon salî ya cinsê mirov de qonaxa Homo Sapiens li derketina holê ya zimanê sembolan rast tê. Bi pêşketina zimanê sembolan şoreşa Homo Sapiens ket pêşiyê. Lewma hewce dike ku mirov hê bêhtir hûrûkûr nêzî diroka li Kevana Bi Bereket bibe. Ev rewş bi lêkolînen der barê genan de jî tê piştastkirin. Kengî bîst hezar sal berî Serdema Dawî ya Qeşayî bi dawî bû, qeşayê xwe vekîşand, Şoreşa Cotkariyê ya Neolitik pêkan bû. Herweha kengî hêza fikrê ya Homo Sapiens bi dewlemendiya heywan û nebatan a cografîyayê re hevdu temam kir, şoreşa herî bi kok a diroka mirovatîyê Şoreşa Civaka Gund-Cotkariyê li Kevana Bi Bereket pêk hat û rê li ber pêşketinên mezin vekir.

Şoreşa Gund û Cotkariyê di warê ziman û fikrê de kir ku mirovatî jî qonaxekê derbasî qonaxekê gelekî li pêş bibe û vê yekê jî kir ku şewegirtîneke civakî ya di ti demê de nehatiye dîtin pêk bê. Bi vî awayî grûba ziman û çandê ya serdest a komên Hind-Ewropa (Ev navlêkirin şaş e, mirov bibêje Koma ziman û çandê ya Aryan rastir e) pêk hat. Mirov koka Kurdên îro dikare weke şaneya kok a komên Hind-Ewropa bide naskirin. Lêkolînen li ser ziman û çanda Kurdan hatine kirin lê rastiyê derxistin holê. Hem cografîya wê ya jiyand, hem jî diroka wê rastiyê bêhtir piştast dikin. Bermahiyên Girê Navikê li Ûrfayê encama lêkolînen dawî ye, û dirokeke navendî din û qebileyên herî kevin ên 12 hezar salî ye, û mînaeke girîng e ku hêza çanda heyî piştast dike. Li ti devera dinyayê mînaeke evqasî kevin nehatiye dîtin. Mirov dema hêza din û qebileyê ya hê jî bi bandor in dinirxîne, eşkere dibîne ku li piştê vê yekê rewşa dirok û cografîyayê diyarker in. Civakê çiqasî demdirêj û hûrûkûr di bin bandora dirok û cografîyayê de mabe, otokontî û xwecihbûna wê civakê evqasî kevin nehatiye dîte. Bandorên bi hêz û mayînde, diroka wê civakê ya paşê bê muhafizekar dike. Mirov hê jî xisletên otantik û xwecihî yê Kurdan dibîne, û di bîngêhê vê rastiyê de ev bandorên bi hêz û mayînde hene. Bêguman di dema neolitikê de hê diyardeya gelbûnê pêk nehatiye. Em li derketina holê ya civaka qebileyê şahidiyê dikin. Li gorî civaka klanê qebile pêşketîneke mezin a şoreşgerî ye. Ji şoreşa neolitikê re mirov dikare şoreşa qebileyê jî bibêje. Di civaka qebileyê de cudabûna çand û zimanan, têkiliyên koçberî û cihwarbûnê dest pê kirîye bi pêş dikevin. Navenda dinî ya li Girê Navikê di dema xwe de jî bo qebileyên bi hezaran salî koçberî û cihwarbûnê di nava hev de pêkanîne bi rola Kabeyê rabûye. Bi taybetî li Ûrfayê, bi giştî li cem Kurdan hisa din hê jî gelekî xurt e. Di vê de para vê rastiyê ne hindik e. Li Girê Navikê, em hebûna çandêke bi hêz nas dikin ku berî şaristanîya bajêr a Sumeran bi hezaran salî pêk hatiye û dewam kirîye. Li ser kevîrên tîk ên mezin, em herfêrî pêşî û mînakên nivîsê yê berîya hiyeroqlîfîyê dibînin. Berîya duwanzêde hezar salan verotîn û niqirandin wan keviran û li ser wan pêkanîna zimanekî sembolî weke hiyeroqlîfîyê di warê dirokê de qonaxekê mezin a xwedî nîrx e.

Em ê li dijî dagirkeriyê li ber xwe bidin

Çalakiya konê mertalê zindî ya li ser sînorê Serêkaniyê ya li dijî êrişên dagirkeriya dewleta Tirk dewam dike. Jinên Heseke yê ku beşdarî çalakiyên bûn diyar kirin ku ew ê bi her awayî li dijî êrişên dagirkeriyê li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin.

Jinên Kantona Heseke yê ku tevî çalakiya kon ya mertalên zindî ya li ser sînorê Serêkaniyê bûn gotin: "Dewleta tirk çi dike bila bike ew ê nikaribe axa me dagir bike. Em ê li berxwe bidin." Jinên Kantona Heseke yê ku tevî çalakiya kona ya mertalên zindî ya li ser sînorê Serêkaniyê bûn gotin: "Em ê wekî gelê li Rojavayê

Kurdistanê heta dawiyê axa xwe biparêzin." **EMÊ AXA XWE BIPARÊZIN** Zekiya Mihemed wiha got, "Ez îro jî Heseke hatime bajarê Serêkaniyê li ber sînor di bin konê mertalê zindî de me û em gelê Rojava bi hemû pêkhatiyên xwe tu car qebul nakin ku faşîstekî wekî Erdogan derbasî axa welaatê me bibe. Em ê

bi hemû hêza xwe li hemberî wî bisekinin. Em tu carî natirsîn û emê li dijî êrişên wan li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin."

BILA DIJMIN BITIRSE Her wiha dayika bi navê Hediya Mihemed jî wiha got: "Dewleta tirk çi dike bila bike ew ê nikaribe axa me dagir bike. Em ê bi dengêkî hevpar li berxwe bidin. Em ê wekî

